

Dumahîk : Îran Celadê...

16 kes ji wan jî di bin 18 saliyê de ye . Darvekirina mirovan diyardeyek e ku di Îranê de roj bo roj xurt û berfirehtir dibe. Fenomenek ku rejîma Îramê her di detspêka bidestvegirtina desthilatê di sala 1979'an de, wek metodek bo jinavbirina neyarên xwe ên siyasî û hizrî û çavtirsandina xelkê bi giştî bikar aniye û tîne. Her di vê derbarê de em dikarin îşare bi îdamkirina çend hezar kes ji xelkê sivîl û bêtawan yê Îranê di sala 1367'an a Rojî (1988) de bikin. Xelkek ku tenê bi tawana vê yekê ku cudahizr bûn, hatin îdamkirin. Niha jî bi sedan kes ji cudbîrên Îranî di girtîgehên rejîma Komara Îslamî de li benda îdamê ne.

Rejîma Komara Îslamî a Îranê dixwaze bi birêvebirina metoda îdamê cewek pirr ji tirs û xofê di civaka Îranê de pêk bîne û çanda tundûtûjîyê di welatê me de xurtir û cihgir bike. Bi baweriya hiqûqzanan, rejîma Îranê li cihê vê yekê ku li pey sedemên encamdana tawan û nerazîbûnên xelkê bigere û wan pirsgirêkan çareser bike, lê rejîma desthilatdar a Îranê bawer e ku dikare bi darvekirina xelkê pêşî ji encamdana tawanan û nerazîbûnên xelkê bigire. Lê pêvajoya bûyeran berevajî vê ramanê nîşan didin. Rejîma Îranê bi dirêjahiya 30 sal ji temenê xwe, bi pêlên berfireh ên îdamkirin û kuştina hezaran kes ji xelkê Îranê ne kariye pêşîya encamdana tawanan bigire û ne cudahizran ji holê rake. Lewra bo berlêgirtin ji îdamê, divê em li dijî hizara îdamê şer bikin ku gellek ji xebat li dijî îdamê giringtir e. Bi hêviya wê rojê ku ne tenê li Îranê belku li seranserê cîhanê îdamkirin û kuştina xelkê bi dawî were û cîhanek pirr li aşî û azadî û aramî pêk were.

Ji Kovara Agirî H. 121

Konfirasê Mafên mirovan

Roja 9ê Çiriya Pêşîn a 2009'an, li bajarê Diyarbekir li Kurdistana Bakur, çaremîn konferansa mafên mirovan yê Kurd, ji aliyê rêxistina ne hikûmetî ve, Pirojeya Mafên Mirovan yê Kurd (KHRP) û bi mêvandariya rêxistina hikûmetî ya Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û bi beşdariya komek berçav ya rêxistin û kesayetiyên çalakên mafên mirovan hat lidarxistin. KHRP" rêxistineke ne hikûmetî û serbixwe ye ,ku di sala 1992'an hatiye avakirin û nevida sereke ya wê saziyê li bajarê Landonê ye. Çalakiyên wê rêxistinê li ser bingeha karkirin bo pêşvebirin û parastina mafên hemû takên akincî yê herêmên Kurdistanê yê bê li ber sovgirtina cudahiyên, olî, ziman, regez û rav û nerînên siyasî û ramanên cuda. Nahîd Husênî wek rojnamevan û çalakvana mafên mirovan li Kurdistana Îranê ,di wê konferansê de beşdar bû û bi pêşkêşkirina gotarekê ,bal kişand ser bînpêkirina mafên mirovan, ku di çarçoveya yasaya giştî de û bi navê ol di welatê Îranê de tê meşandin ,û herwiha amaje da jiyana pir dijwar , asteng û pirsgirêkên li hemberî takên Kurd di Kurdistana Îranê de, ku di hemû warên siyasî, civakî û kultûrî de dimeşînin. Hêjayî gotinê ye, ku roja 9ê Çiriya Pêşîn a 2009'an, Nahîd Husênî û şanda Kurdistana Başûr serdana şaredariya bajarê Diyarbekir kirin, û ji aliyê Osman Baydemir, serokê şaredariya Amedê bi germî hatin pêşwazîkirin.

